



















	<p style="text-align: center;"><b>Çi hat serê beqê?</b>  <b>Ji Peter Härtling</b></p> <p style="text-align: center;">übersetzt von Mahmut Aydin</p>
	<p>Du sal berê ez bi zarokê xwe re li Hollandayê li ber deryayê bûm.</p> <p>Hewa baş bû û em pir caran diçûn avjeniyê.</p> <p>Kurê min Clemens, ku wê demê pênc salî bû, ji bo deryayê beqek lastîkî ya kesk û zer a mezin girtibû, ku wî pir jê hez dikir û her gavê li dû xwe dikişand.</p> <p>Di avê de li beqê siwar dibû û ew li ser pêlan diajot.</p>
	<p>Nizanim ka hûn hemû bi kêş û vekêşê dizanin an na. Kêş û vekêşa her deryayekê heye. Bi vekêşê re av tê derbasî reşahiyê dibe, bi kêşê re av ji ser reşahiyê dikişe û diçe.</p> <p>Ev yek ewqas bi hêz û bi lez diqewime, kesê ku dema kêşê di deryayê de avjeniyê dike, derya wî ji nişka ve û bi bilez dikişîne nava xwe.</p> <p>Ji ber vê yekê divê kes di dema kêşê de di deryayê de avjeniyê neke.</p>
	<p>Clemens jî ev yek dizanibû û qet nedikir.</p> <p>Lê ew fikirî ku beq dikare vê bike, û wî beq danî ser avê, li bendê ma ku ew piçekî avjeniyê bike û ji nişka ve ez dibihîzim ku ew diqîre:</p> <p>„Beq diçe! Beq diçe!“</p> <p>Û ez dibînim, beq li ser deryayê çiqas pir dûr ketiye.</p>
	<p>Ez beziyam nava deryayê, da ku beqê bigirim, lê min hîs kir ku herk çawa lingên min dikişîne, çawa qûm bi pêlan re diherike nava deryayê, paşê ez rawestiyam û min li beqê temaşe kir. Ew her diçû piçûktir û piçûktir dibû.</p>
	<p>Clemens bi awayekî tirsnak giriya. Wî ji min pirsî:</p> <p>"Beq niha ber bi ku derê ve avjeniyê dike?"</p> <p>Ji ber ku li aliyê din ê deryayê Îngilîstan heye, min jê re got:</p> <p>"Beq dê sibê li Îngilîstanê be."</p> <p>Ji wê demê û pê ve, min çîrokên li ser tiştê ku dibe ku bi serê beqa li ser deryaya dûr de hatibe, xeyal dikirin, ku me ew êdî di demek kurt de nedît</p>

	<p>Dibe ku ev çîrok:          Beq avjeniyê dike û dike.          Ew li ser deryayê pir piçûk e.          Vapûrek mezin di ber wê re derbas dibe, kurikek ji vapûrê li jêr dinêre, beqa piçûk dibîne û gazî dike:          "Li vir beqek heye! Ez beqê dixwazim!"</p>
	<p>Kaîtptan, dema ku ev bihîst, dibêje:          "Em ji ber te nikarin vapûrê bidin rawestandî.          Heger em keştiyê rawestînin, dê keştî ewqas dûr raweste ku em êdî beqê nebînin."          Ji vê yekê kurik destê xwe ji beqê re li ba dike û ew pêşde avjeniyê dike - belkî digihîje Îngilîstanê.</p>
	<p>An jî ev çîrok:          Beq avjeniyê dike û dike, bi rastî jî tê Îngilîstanê.          Dîsa pêl bilind e. Av beqê dibe dixê lûleyekê ku ava qirêj jê diherike deryayê.          Lehiya vekêşê beqê dixê hundirê lûleyê.          Hundir tarî ye û bêhna pîs tê.          Lûle teng dibe, lê av xwedî hêzeke wisa ye ku cihê beqa lastîk a belengaz her û her kûrtir dibe.</p>
	<p>Paşê pêl kêmbûn dibe û av vedikişê, beq di lûleya ku bêhna qenî û zibilê jê tê de asê dibe.          Ma ew ê her tim li wir bimîne? Na!          Hewa hêdî hêdî ji beqê diçe. Beq piçûk dibe. Wekî beqa piçûk a bi çermê qermiçî ji lûleyê avjeniyê dike û dertê.          Pêlên avê lê didin û wê davêjin peravê avê. Zarokek li wir wê dibîne, digire, pif dikê û diwerimîne.</p>
	<p>Ez ji xwe re çîrokek beqê ya pir aramîdar difikirim:          Beq demeke dirêj li ser deryayê digere, heta ku nêzî peravên Îngilîstanê dibe.          Pêl her ku diçe bilind dibin.          Bahozek li ezman kom dibe.          Birûsk vedide.          Bayekî pir sivik vediguhere bahozeke mezin, ku ew qas tund e ku keştiyên herî giran jî zû dikevin benderê û li bendê dimînin ku ew derbas bibe.</p>

	<p>Lêbelê, beq ew qas sivik e ku ji bo wê ferq nake pêl çiqas bilind in.</p> <p>Ew ji pêlekê ber bi pêlekê ve hildiperike, carinan di nav dolên pêlan de difize ku ava li jora wê li hev diqelibe û her kesê ku beqên lastîkî yên wiha nas dike, niha tenê ditirse ku devgirk derkeve û hewa jê bifûre.</p> <p>Paşê beq diçû xwarê.</p> <p>Lê beqa di çîroka min de naçe xwarê.</p>
	<p>Demek berê, xortekî ku li gundekî îngilîzan ê peravê dijiya û carna bi qayîka bavê xwe, ku ew masîvan e, derdikeve deryayê, bêyî ku ji bavê xwe bipirse, careke din li qayîkê siwar bû.</p> <p>Wî ev yek gelek caran kiriye.</p> <p>Lê xort vê carê bala xwe neda hewayê, ku wê hewa çawa be.</p> <p>Ev xeletiya wî bû.</p>
	<p>Ew hê bêtir ber bi nava deryayê ve çû û ji nişka ve pêlên bi qasî xaniyan ber bi wî ve hatin, qayîk li dora xwe hilfirandin û ber bi jor ve avêtin.</p> <p>Xort, ku ez hema wisa jê re dibêjim Edward, bêrika di destê xwe de wenda dike û bêçare li ser deryayê dizivire.</p> <p>Av berdewam dikişê nava qayîkê û Edward hewl dide ku wê bi destên xwe vala bike.</p> <p>Êdî ew qet nikare berdewam bike.</p> <p>Ji ber ku qayîk tije av bûbû, demeke dirêj nemabû ku qayîk wek keviyekî binav bibe.</p>
	<p>Xort pir ditirse, diqîre, banga alîkariyê dike, lê kes wî nabihîse.</p> <p>Pêl wî bi paş û pêş ve dipekînin, ew gelek avê dadiqurtîne û hewl dide ku avjeniyê bike.</p> <p>Ew bi rastî avjenîgerek baş e, lê êdî nikare di vê deryaya bi xezeb de avjeniyê bike.</p>
	<p>Paşê beqê dibîne.</p> <p>Beq bi pêlekê ber bi wî ve tê anîn.</p> <p>Ew tijî hewa ye.</p> <p>Lawik hişk bi beqê digire û li ser pêlan lê siwar dibe, li ser pêlan dadikeve û bilind dibe, wiha digihîje reşahiye.</p> <p>Niha beqa min xortek jî xilas kir.</p>

	<p>Û di dawiyê de, çîrokek din:          Beqê avjenî kir û çû.          Hewa xweş e û ew zû digihîje Îngilîstanê.          Li wir ew ji aliyê keçekê ve, ku bi diya xwe re li ber peravê dimeşe tê dîtin.          Keçik dibêje:          „Ew beqek xweşik e, ez dixwazim wê bi xwe re bînim.“          Dayik dibêje:          „Lê dibe ku beq bixwaze avjeniyê bidomîne.“</p>
	<p>Tu dizanî çî, em ê bantekê bi beqê ve bizeliqînin, bi pênûseke stûr li ser binivîsin ku av nikaibe jê bibe:          Beqê li Îngilîstanê ji Susanne re got roj baş.          Yê ku wê bibîne divê wê bişîne!“          Û ew beqê dîsa li ser deryayê dişînin.</p>
	<p>Li Hollandayê xortekî bi navê Egon wê dibîne, ew jî navê xwe li ser bantekê dinivîse û bi wê ve dizeliqîne.          Beq avjeniya xwe didomîne; tê Fransayê.          Li Fransayê keçek notekê pê ve dike, navê wê Jacqueline; li Spanyayê, kurek, navê wî Jose ye.          Û di dawiyê de beqê ku ji rêwîtiyê hez dike gişt bi nav e.          Ew bi avjeniyê derdikeve deryayê û careke din nayê peravê.</p>
	<p>Niha hûn kîjan çîroka beqê vedibêjin?</p>
	<p>Dawî</p>